KÜRT YAZARLAR DERNEĞİ
KOMELEYA NİVÎSKARÊN KURD
KURDİSH WRITERS' ASSOCİATİON
2004

Ji bîr û raya gişti re

Komelaya Nivîskarên Kurd li Amedê, Encamnameya Duyemîn Konferansa Tevgera Ziman û Perwerdehiya Kurdî (TZPKurdî) ku di navbera 27-28'ê Tebaxê de pêk hat û ji raya gişti re hate daxuyandin pesend dike û piştgiriyê dide hemû xalên encamnameyê û berevaniya cîbicîanîna hemû xalan dike!

Komeleya ku hez û hemmata xwe ji ziman û çand û wêjeya dêrîn û giranbiha ya Neteweyê Kurd û wêjekarên payeberz Baba Tahirê Hamedanî, Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî, Herîrî, Koyî, Mehwî û Cegerxwîn werdigire di pêvajoya lêxwedîderketina ziman û her weha daxwaza meşrû, millî, mirovî û rewa yên gelê Kurd de, bi pênûsa xwe, bi dengê xwe li gel daxwazên gelê xwe ye.

Ji vê boneyê, Komeleya me, bang li Nivîskarên Kurd, li Pên û Nivîskarên Tirk, Pena Kurd-Pen a li Elmanya, û li Pena Navneteweyî dike, ku di vê pêngava pêvajoya raperîna zimanê kudî de mil bidin tevgera perwerdahiya bi zimanê dayikê, dengê xwe bixin ser dengê gelê kurd yê ku ji kûrahiya dîrokê tê û olan dide.

Weke her qewmê li ser rûyê gerdûnê xwedî-cih xwedî-ax, Gelê kurd yê ku pêma û miratxurê 33 şaristaniyên wenda ye, ku di nava malbata mirovahiyê de heta niha ne xwedî mafê xwe yên rewa be; bi zimanê xwe nikaribe serbest biaxive, nikaribe perwerdehiya bi zimanê dayika xwe bibîne, neşê xwe li ser axa azad û serbixwe bijî… ev di serî de sermî û fihêta malbata mirovahiyê ya pirdeng, pirreng, û pirual e, ku di berpirsê wê jî Komara Tirkiye yê.

Bi vê baweriyê, em bang li Rêvebiriya Komarê, di serî de li Serokkomar Rêzdar Abdullah Gul, Serokwezîr R. Tayip Erdogan û wezîrê Perwerdehiya Millî ya Tirkiyeyê Huseyîn Çelîk dikin, ku dengê gelê kurd bibihîzin, û bibin xwedî-helwesteke rêveker û çareserker.

08/09/2008/Amed
Komeleye Nivîskarên Kurd
Desteya Rêveber

Navnîşan: Huzurevleri Mah. Dr. Sıtkı Göral Caddesi
Kalem Sokak No: 32 K: 4
Kayapınar/Diyarbakır

WEB: www.kurtyazarlardernegi.org.tr
Tlf-Fax: 0090 0412 237 43 16
GSM: 0090 533 655 69 85
E-Mail: komeleyaniviskaran@yahoo.com
komeleyaniviskaran@hotmail.com
a_irba@yahoo.com